# JI BO PEYVA LAÎLAHEÎLLALLAH FEYDE BIDE TE DIVÊ TU ÇI BIKÎ?

## Tu Dizanî, Şertên Kelîmeya Tewhîdê Hene?

Dema ji pirên me bê pirskirin "Tu çawa bûyî Muslîm?" an jî "Ketina te ya dînê îslamê çawa çêbû?" em ê wiha bibêjin: "Me got 'Laîlaheîllallah, Muhammedûn Rasûlullah!' û em bûn Muslîm.

Piştre, dema pirsek bi awayê "Belê, ji bo tu bikevî Îslamê te ev kelîme got, başe lê Allah (ac) qebûl kir gelo?" bê pirskirin dibe ku em ji ber vê pirsê şaşmayî bimînin. Em bi mînakekî vê meseleyê îzah bikin:

Ji bo ku Allah (ac) ji me razî bibe em nimêj dikin. Qebûlkirina nîmêjê ya li îndallah; bi girêdayîbûna şertên wê û dûrketina ji hêmanên ku van şertan xera dikin mimkûn e.

Eger me destnimêj girtibe û berê xwe dabe qibleyê û nîyeta xwe anîbe û di nimêjê de ji tiştên ku nimêjê xera dikin dûr ketibin nimêja me meqbûl û muteber e. Belê, ew kesê van şertan pêk ne anîbe û di nav nimêjê de tiştekî xwarinê bixwe an tiştekî vexwarinê vexwe an jî bi derdora xwe re biaxive nimêja wî meqbûl e gelo?

Helbet na... Va kelîmeye "Laîlaheîllallah" jî wisan e. Ji bo ku ev kelîme bê qebûl kirin hin şertên wê û heta nefesa dawî muteber bibe jî hin hêmanên ku wê xera dikin divê jê dûr bikevin hene. Mirovek heta van pêk neyne vê kelîmeyê gelek caran dubare bike jî ev gotina wî cihê xwe nagire û ne muteber e.

## Taxût Çi Ye?

Redkirin û dûrketina taxûtan şertê ewil ya qebûlkirina vê peyvê ye. Pêxemberan (asm) bitevahî ji bo ku însanan gazî vê heqîqetê bikin hatine şandin:

**"Sond be, me ji her ummetê re ji bo ku bibêjin (teblîx bikin): "Ji Allah re îbadet/evdîtî bikin û xwe ji taxût biparêzin." pêxemberek şand. Bi vî awayî Allah hinekên wan hîdayet kir û li ser hinek ji wan jî rêşaşîtî heq bû. Li ser rûyê erdê bigerin û aqûbeta derewkaran/mukezziban çawa bûye bibînin."** (16/Nahl, 36)

Allah (ac) di ayetekî din de Kelîmeya Tewhîdê wek qulpa herî zexm binav kirîye û ragihandîye ku xwepêgirtina pê ve jî bitenê bi înkarkirina taxût mimkûn e:

**"Di dîn de kotekî/zorî tune. Rêya heq ji rêya batil (bi awayekî qet-hî) veqetîya ye. Kî (bi awayê înkar kirin û tekfîr kirin û jê dûr ketin) taxût înkar bike û îmân bi Allah bîne; wî, xwe bi qulpeke zexim ê qetandin jê re tune (bi kelîmeya tewhîdê ve) girtî ye (û ketîye dînê îslâmê). Allah (yê ku hemû tiştan dibihîze û îcabetî dûayan dike) Semî û (zanayê her tiştî) Alîm e."** (2/Baqara, 256)

Di Îslamê de qulpa zexm ya ku naqete Kelîmeya Tewhîd e. Ji bo kesek bibe ji ehlê Kelîmeya Tewhîdê û ew Laîlaheîllallah ya ku gotiye feyde bide wî du şert hatine zikirkirin: Înkarkirina taxût û îman anîna bi Allah (ac).

Taxût têgeheke Quranî ye û di heşt ayetên cuda de dibore. Redkirina taxût ku ji têgehên Îslâmê ya herî girîng e, rojeva hevpar a hemû pêxemberan e. (bnr. 16/Nahl, 36)

## Li Gorî Quranê Taxût

- Çavkanîyên agahî ya kevneşopî an dînî an jî sîyasî ku ji xeynî pîvanên Quranê pîvanan datînin û bi vê awayê însanan ji ronahîya wehîyê bal bi tarîtîya kufrê ve beralî dikin (bnr. 2/Baqara, 257)
- Ew rêyên tên şopandin û rûmetên/nirxên tên hebandin ku di oxira wan de tê jiyîn û mirîn û dostanî û dijminahî li gorî wan tê diyarkirin (bnr. 4/Nîsa, 76)
- Ew kes û saziyên qanûnên dijberê qanûnên Allah (ac) çêdikin û mirovan gazî van qanûnan dikin û qanûnên ku datînin (bnr. 4/Nîsa, 60)
- Hemû heyînên ji xeynî Allah (ac) îbadet li wan tên kirin û heyînên zindî an mirî ku weke Allah (ac) tên hezkirin an tên tirsîn û bi dilsozîtî iteat li wan tê kirin (bnr. 39/Zûmer, 17)
- Her mirovê îdîa bike ku îman bi Allah (ac) anîye lê taxût înkar nake; fêm dibe ku wî îman bi taxût anîye û bûye evdê wî û Allah (ac) înkar kiriye. (bnr. 4/Nîsa, 51; 5/Mâîde, 60)

## Birayêmin, niha em bi hevdu re bifikirin:

Çend kes ji me bi têgeha "taxût" dizane?

Çend ji me vê kelîmeyê berê de bihîstîye?

Xoceyan û waizên ekranê û şêx û aliman çima vê têgehê ji me re nevegotin û hêj jî behsa wê nakin?

Digel ku pêxemberan bitevahî ji qewmê xwe re hatine şandin însanan gazî vê heqîqetê kirine jî çima dawetvanên îro hinareya hevpar a hemû resûlan ji me vedişêrin?

## Taxût; ku parastina jê hinare û banga hevpar a hemû pêxemberan e,

hemû tiştên ji xeynî Allah (ac) îbadet lê tê kirin e.

Tirbe û gorên ku însan ji wan re dua dikin û hewara xwe digihijînin wan; rêveber û parlamentoyên ji mirovan re qanûnên ku Allah (ac) jê ne razîye çêdikin; îdeolojîyên ku dixwazin jiyana mirovan bi hin rûmetan ve beralî bikin; olnasên li ser navê dîn mirovan dixapînin û heqîqetên Îslamê vedişêrin; dawetvanên ku mirovan ji ronahîya wehîyê gazî tarîtîyên şirk û gunehan dikin; rûmetên/nirxên lihevhatî ku mirov di oxira wan de dijîn û dimirin... Ev hemû her bi yek taxût in.

Tu evana cara yekem dibihîzî, ne wisan? Nexwe êdî wextê seknê û fikirînê û li gorî kitêba Allah (ac) û sunneta Rasûlullah (ass) serrastkirina jiyana me hatiye.

Dema ku em ketin qebrê an jî dema em di hizûra Allah (ac) de hatin rawestandin, wê Allah (ac) me ji Kitêba xwe û ji peyama Rasûlê xwe (ass) ya ku gihiştîye me bikişîne hisabê.

Em destûr nedin ku hin kes li ser navê Allah (ac) û li ser navê dîn me bixapîne.

A niha soza ku me daye Allah (ac) (bnr. 7/A'râf, 172) û kelîmeya "Laîlaheîllallah" a ku em ji şertên wê bêxeber in ji bo em baş fêm bikin de were em ligel te bi hurgilî li ser têgehên îlah û îbadet û şirk bisekinin.

## Gelo Tu Dizanî Ka Tu Ji Bo Çi Hatîyî Xuliqandin?

Te qet ev pirs ji xwe kiriye? "Allah (ac) min ji tunebûnê xuliqandiye û riziqandiye û hemû kaînat ji bo min musexer kiriye û xistiye bin xizmeta min û min kiriye herî rûmetdarê mexlûqatan, ka gelo sebebê vê çi ye?

**"Bitenê ji bo ku îbadet li min bikin, min cin û însan xuliqandin."** (51/ Zarîyat, 56)

Armanca xuliqandina însan tewhîd e. Tewhîd jî tê wateya di îbadetê de tewhîdkirina Allah (ac) û evdîtîya jê re. Îbadetên mirov weke nimêj û rojî û qurban bitenê ji Allah (ac) re bê kirin û heyata xwe bi temamî li gorî şerîeta Allah (ac) rêkûpêkkirin û tenê serî li qanûnên Allah (ac) re bê tewandin e. (bnr. 1/Fatîhe, 5)

Ji ber ku armanca hebûna mumîn tewhîd e, "rojeva wî ya bingehîn" ya neguherbar û di rêza yekem de divê herûdaîm tewhîd be. (Wekî din bnr. 38/ Sâd, 27)

Sedema xuliqandina însanan ya ku Allah (ac) wan xuliqandiye bitenê ev e: Bitenê/Enceq/Bi dilsozîtî evdîtîya ji Allah (ac) re…

Ew kesên bitenê ji Allah (ac) re îbadet nakin yan jî ligel Allah (ac) ji heyînên din re îbadetê dikin, îxanet li armanca xuliqandina xwe kirine û soza ku dane Rabbê xwe xera kirine.

## Îbadet Çi Ye?

Ji bo em girêdayî armanca xuliqandina xwe bibin xisusa herî girîng ev e ku divê em bizanibin îbadet çi ye. Îbadet; peyv û amelên ku Allah (ac) jê hez kiriye û jê qayîl bûye û bitenê ji Allah re tê kirin in.

Nimêj îbadetek e. Ji ber ku Allah (ac) ji nimêjê hez dike û jê qayîl e ji mumînan re emir kiriye. Nimêj, eger bitenê ji Allah (ac) re bê kirin dibe îbadet.

Em bifikirin ku mirovek bibêje: "Ez nimêja xwe ji bo dê û bavê xwe an ji bo patronê xwe an jî ji bo dewleta xwe dikim." em dizanin ku nimêja wî mirovî ne meqbûl e û îbadeta xwe ji xeynî Allah (ac) ji heyînên din re kiriye.

## Duakirin jî îbadetek e.

**"Rabbê we wiha got: "Hûn dûa ji min re bikin ez jî îcabeta dûayên we bikim. Qet tu guman tune ku ew ên di îbadetkirina min de quretîyê dikin wê bi situxwarî/binpêkirî bikevin cehennemê."** (40/ Mûmîn/Xafîr 60)

Rasûlullah (ass) vê ayetê dixwîne û wiha dibejê:

**"Dua, îbadet bixwe ye."** (Ebû Dawûd 1479; Tîrmîzî, 2969)

Mirovek divê bitenê ji Allah (ac) re dua bike, dema bikeve tengasîyê divê bitenê ji Allah (ac) hêvîdar be û ji bo tengezarîya wî biborîne hewceye ku bitenê ji Allah (ac) alîkariyê daxwaz bike. Lewre dua îbadet e û îbadet jî bitenê ji Allah (ac) re tê kirin.

## Dayîna rayeya hukmê ji Allah re jî îbadet e:

**"…Hukim bitenê aîdê Allah e. Wî emir kiriye ku hûn evdîtîyê/ îbadetê jê pê ve ji tu kesî re nekin. Ha ev e dînê rasterast. Lê pirên însanan nizanin."** (12/Yûsuf, 40)

Bawerîya ku hukim danîn/qanûnçêkirin aîdê Allah e û jiyaneke li gorî vê heqîqetê; ne zêde pê de çûn e, ji esasên nebe nebeya bawerîya Îslamê ye. Mijara ku hukim aîdê Allah e bi du tiştan ve tê pêwendîkirin: Evdîtîya ji Allah (ac) re û dîneke rasterast. Ew kesên rayeya hakîmîyetê didin Allah (ac) û ji xeynî qanûnên wî qanûnan nas nakin, evana evdên Allah (ac) in û mensûbên dînê rasterast in. Ew ên serwerîyê bê qeyd û şert ji xeyrî Allah di kesekî din de an di îdeolojîyekî de an jî di sazîyekê de dibînin ewana ew kes in; îbadetê hin nav û ramanên ji xeynî Allah (ac) dikin ku Allah (ac) der heqê wan de qet tu delîl nazil nekirîye.

Hukim; yanê mafê/heqê qanûnçêkirin û diyarkirina helal û heramê bitenê aîdê Allah e (ac). Û li ser bawerî û amelê dayîna vê mafê ji Allah (ac) re jî îbadetkirin e. Divê mirov pêbawer be ku ev heq bitenê aîdê Rabbê wî yê. Ligel vê divê destûra hukimdayînê bi tu awayî nede parlamentoyan û qiralan û axayên zilimkar ku di vê mijarê de bi Allah (ac) re berebezîyê dikin.

## Tu Dizanî Kelîmeya Tewhîd û Kelîmeya Şehadetê Tê Ser Çi Maneyê?

### Kelîmeya Tewhîd

**La:** Tune

**Îlahe:** Qet tu îlah

**Îlla:** (Awerte/Mustesna) Enceq yek îlahek tenê heye.

**Allah:** (Ew jî) Allah e.

### Kelîmeya Şehadetê

**Eşhedû:** Ez şahidî dikim ku

**En la îlahe:** Qet tu îlah tune.

**Îlla:** (Awerte/Mustesna) Enceq yek îlahek tenê heye.

**Allah:** (Ew jî) Allah e.

Dema ku em Kelîmeya Tewhîdê dibêjin, bi pêşanî em hemû heyînan ji wesfê îlahtîyê nefîy dikin.

Em îlan dikin ku qet tu tişt nabe û nikare bibe îlah. Paşê şahidî dikin ku îlahtî bitenê aîdê Allah e û Allah îlahê heq ya yekane ye.

Di Kelîmeya Tewhîdê de têgeha kilîd "îlah" e.

## Nexwe Îlah Çi Ye?

Îlah; ma'bûd e. Tê ser maneya ew ê îbadet lê tê kirin û ew ê îbadetê heq dike û ew ê layiqê îbadetê ye. Dema em dibêjin "Laîlaheîllallah" bi rastî em vêya dibêjin:

"Allahê min; ez ê nimêja xwe û rojîya xwe û qurbana xwe û duaya xwe û hemû îbadetên xwe bitenê ji bo te bikim. Tu xwedî û serwerê hemû gerdûnê/kaînatê yî. Ez ê ji te pê ve qet tu qanûnçêkerekî nas nekim. Rast ew e ku te jê re gotiye rast e; çewtî jî ya ku te jê re gotîye çewt e. Ew ê feyde û zerar di destê wî de ye tu yî. Ez ê ew tiştê ku wê feyde bide min bitenê ji te bixwazim û ji bo ku ji tiştê zerar dide jê xelas bibim jî ez ê xwe bitenê bispêrim te. Ez destûrê nadim ku tu kes jiyana min beralî bikin. Ez ê dostên te ji xwe re wek dost bigirim û dijminên te jî ji xwe re wek dijmin bigirim. Armanca min bitenê wê bibe bidestxistina razîbûna te be. Ez ê ji bo te bijîm û ji bo te bimirim.

## Belê, Şirk Çi Ye?

**Şîrk:** Îbadetkirina ji xeynî Allah an jî ligel Allah (ac) îbadetkirina hin heyînên din e.

Kîjan îbadet bibe bila bibe, kesê dema yek ji van îbadetan ji bilî Allah yan jî ligel Allah (ac) îbadetê yekî an jî li çend heyînan re bike, fêm dibe ku wî kesî ji Allah (ac) re şirîk çêkiriye.

Hin ayetên di Qur'ana Pîroz ku Kitêba me ya berz e de li ser vê mijarê diborin bi hûrnêrîn binêrin: Em hîn bibûn ku rayeya hukimdayînê aîdê Allah e (ac) û dayîna vê rayeyê ji Allah (ac) re jî îbadet bixwe ye. Allah (ac) der heqê wan kesên ku vê rayeyê didin heyînên din de wiha ferman kiriye:

**"Nexwe, hinek şirîkên wan hene ku tiştên Allah destûr nedaye ji xwe re kirine şerîet/qanûn? Eger (li ser paşvexistina/texîrkirina ezaba wan heta qiyametê) ehdeke qethî nebûya, helbet wê di navbera wan de hukim bihata vebirîn. Bêguman ji zilimkaran re ezabekî biêş û jan heye."** (42/Şûrâ, 21)

Ew ên tiştên Allah (ac) destûra wan ne daye dikin wek şerîet û bi awayê helal-heram an jî qedexe-serbest dikin qanûn, wek hemkûf digirin ku ji Allah (ac) re dikin şirîk. Lewre qanûndanîn û diyarkirina şerîet, ji sifetên Allah (ac) ên herî xûya ne. (bnr. 12/Yûsuf, 40; 18/Kehf, 26)

Allah (ac), wan ên vê rayeyê ji ew ên nadin pey şerîeta wî û ji cem xwe ve qanûnan çêdikin zem dike û dilomîne. Allah (ac) wiha beyan dike; ew heyînên ku rayeya zagonsazîyê danê wan ji Allah (ac) re şirîk çêkirine:

**"Wan dev ji Allah berdane û hahamê xwe û keşeyên xwe û Mesîhê kurê Meryem ji xwe re kirin Rab. (Lê belê) ew bi îbadeta yek îlâhekî bitenê re hatibûn emirkirin. Ji wî pê ve (yê ku îbadetê heq dike) tu îlâh tune. Ew (Allah) ji tiştên ku pê şirîkatîyê dikin berî ye/ munezzeh e."** (9/Tewbe, 31)

**Gelo tu dizanî ku Rasûlullah (ass) vê ayetê çawa tefsîr kiriye?**

"Rasûlullah (ass), dema ku vê ayetê dixwend di wê lehzê de Adiy b. Hatim ku ew di cahilîyê de bibû Fille kete hûndir. Di sitûyê wî de xaçeke ji zîvê hebû. Got: "Wan olnas û keşîşên xwe wek Rab negirtin." Rasûlullah (ass) wiha got: 'Olnasên wan helalên Allah (ac) heram û heramên Allah (ac) jî helal dikirin. Ew jî dibûn tabiê wan. Ha ev, îbadeta wan ya ji olnasên wan re ye.' " (Tirmizî, 3095; Tefsîra Ibnî Ebî Hatîm, rîwayetên bi van Numreyan: 2/1784, 10057-10058)

— Ayet û tefsîra Pêxemberê me (ass) nîşan dide ku di diyarkirina tiştên helal-heram û qedexe-serbest û meşrû-xeyrîmeşrû de otorîteya yekane Allah e (ac). Ev, ji ber vê ye ku ew "Er-Rab" e. Rab; ew e ku terbîye û sererast dike û ji hev derdixe û digerîne ye. Allah (ac) bi qanûnên danîye re însanan terbîye dike û civakan sererast dike.

— Alim an rewşenbîr an abid an parlamenter an rêveber an jî serokeşîr...

Ew ê ku vê rayeyê bide yekî ji van, tê ser vê maneyê ku wî ji xeynî Allah ji xwe re kirine rab.

Em hîn bibûn ku duakirina ji Allah (ac) re jî îbadet e.

Rabbê me; der heqê wan kesên ji xeynî zatê xwe ji mirovên salih/qenc in re an ji rohanîyeta wan re an jî ji meqber û tirbeyên wan re dua dikin wiha ferman dike:

**"Dûayên heq, yê ji Allah re (tê kirin) e. Ew ên ji xeynî wî dûa ji wan re tên kirin jî bi tu awayî nikarin bersivê bidin dûayên wan. Rewşa wan (ên ku ji xeynî Allah ji hinên din re dûa dikin) weke vê ye ku ji bo av were devê wî her du çengên/mistên xwe dirêjî avê dike (û vê bes dibîne). (Hal ev e ku bi vê awayê) ew (av) qethîyen nagihîje wî. Dûayên kafiran (ên ku ji xeynî Allah ji hinên din re dikin) ji xerifîtîyê/ji rêşaşîtîyê ku dê winda bibe pê ve ne tiştekî din e."** (13/Ra'd,14)

**"Şevê dixe ser rojê û rojê jî dixe ser şevê. Roj û heyv jî stûxwar kiriye. Her yek ji wan heta demeke diyarkirî di rêgeha xwe de diherike diçe. Ha ev, Rabbê we Allah e. Hikumranî/Serwerî bitenê aîdê wî ye. Ew ên ku hûn ji xeynî wî dûayê li wan dikin, bi qasî mûyekî jî ne xwedîyê tiştekî ne. Hûn ji wan re dûa bikin, dûayen we nabihîzin. Bibihîzin jî nikarin bersivê bidin we. Roja qiyametê şirka we red dikin. Tu kes wekî wî yê ku (agahdarê her tiştî) Xabîr e, nikare agahîyê bide te."** (35/Fatir,13-14)

**"Baldar bin/Dîqat bikin! Dînê xalis aîdê Allah e. Ew ên ji xeynî wî welîyan/dostan digirin (wiha dibêjin:) "Ji bo ku me nêzî Allah bikin em îbadetê wan dikin." Allah, di mijarên ku tê de ketine îxtîlafê de wê di navbera wan de hukim bide. Bêguman Allah, kesê derewker û kafir nagihîne hîdayetê."** (39/Zûmer, 3)

Di bingeha şirkê de ramana/tesewura "Allahê dûr" û "însanê bi qisûr" heye: "Em kî ne ku rasterast ji Allah (ac) re dua bikin?", "Gunehên me ew qas zêde ne ku em ê bi van devên qirêj çawa ji Allah bixwazin?" Ev ramana batil jî însan bal bi lêgerîna "weliyê ku mirov nêzî Allah (ac) dike" ve beralî dike. (bnr. 2/Baqara, 186; 5/Mâîde, 35; 34/Sebe', 22-23; 39/Zûmer, 43; Wekî din bnr. 6/En'âm, 14)

Eger tu bal bidî, Allah (ac) ragihandîye ku ew ên ji xeynî zatê wî ji heyînên din re dua dikin tê ser vê maneyê ku ev amelên wan wek îbadet hatîye nirxandin. Herwiha ev kar û kirinên wan şirk bixwe ye û ew ên vê amelê dikin jî kafirên derewkar bixwe ne.

Jibîr neke ku îbadetkirina ji xeynî Allah (ac) ji heyînên din re şirk e û şirk, zilma herî mezin e. Guhê xwe bide şîreta Luqman (as) ku ji kurê xwe re kiribû:

**"Dema ku Luqman şîret dida kurê xwe wiha gotibû: "Kurê min! Ji Allah re şirîkan çêneke! Bêguman şirk, zilmeke mezin e."** (31/Luqman, 13)

Şirîk çêkirina te, wê amelên te bitevahî pûç û betal bike û di her du cîhanê de tu yê bibî ji wan ên bi xûsranê ketine.

Guhdarîya vê hişyarîya ku Allah (ac) ji hemû pêxemberan re wehîy kiriye bike:

**"Sond be ji te re û ji (pêxember) ên berîya te re wiha hatîye wehîykirin: "Eger tu şirîk çêkî wê hemû amelên te pûç bibin û tu yê bibî wan ên xesirî."** (39/Zûmer, 65)

Digel ku efûkirin û rahmet û bexişandina Allah (ac) bi qasî hemû heyînan dorpêç bike firehe jî dema tu şirîk ji Allah (ac) re çêki tu yê ji vê xweşîyê mehrûm bimînî:

**“Bêguman Allah, qet tu carî şirk çêkirina ji xwe re efû nake. Ji xeynî vê (şirk çêkirinê) ji kî re bixwaze wî efû dike…”** (4/Nîsa, 48)

Berîya tobekirinê mirin bê, guneha ku Allah (ac) efû nake şirk e. Hemû gunehên li derê şirkê, êdî dimîne ji meşîeta/daxwaza Allah (ac) re. Eger bixwaze wê bibexşîne, nexwaze nabexşîne.

Şirk ev e; amelê ku îslam wek îbadet qebûl dike ji Allah (ac) pê ve ji kesên din re bê kirin an jî ji sifetên ku aîdê Allah (ac) in yek ji wan dayîna heyînek e. Pir cureyên şirkê hene. Di hezkirinê de şirk (bnr. 2/Baqara, 165) û di îteatê de şirk (bnr. 9/Tewbe, 31) û di dua û îbadetê de şîrk (bnr. 7/A’raf, 37;10/Yûnus, 106) û di qanûn çêkirinê de şirk (bnr. 18/Kehf, 26; 42/Şûra, 21) û şirka ji bo ku pevkelijandina civakê pûtgirtina hin heyînan (bnr. 29/Ankebût, 25)...

Weke ku me delîlên wê di rêzên borî de xwendin ew ê şirîk ji Allah (ac) re çêdike; bêbextiya herî mezin li Allah (ac) kiriye û zilma herî mezin bi dest xistîye. Ji ber vê yekê amelên wî bitevahî pûç û betal bûne. Axir, cennet ji wî re hatiye heramkirin:

“Sond be ew ên dibêjin “Allah, Mesîhê kurê Meryem bixwe ye” bûne kafir. (Hal ev e ku) Mesîh gotibû: “Gelî Benî Îsraîl! Ji Allah re evdîtî bikin ku ew hem Rabbê min û hem Rabbê we ye.” Bêguman kî ji Allah re şirîk çêke, Allah cennet jê re heram dike. Sitargeha wî agir e. Ji bo zilimkaran tu alîkar jî tune.” (5/Maîde, 72)

## Belê, em te gazî çi dikin?

Em te gazî dînê hemû pêxemberan û dînê îslamê ku li îndallah muteber û yekane ye dikin.

Em te gazî bal bi dîn û îbadetkirina ku bitenê mexsûsê Allah e û bal bi tewhîda pak û paqij ku bi tu awayî şirîk jê re nayê çêkirin ve dikin.

Em te gazî Milletê Îbrahîm dikin ku di wê de hemû taxût tên redkirin û ji wan dûr tê mayîn û bitenê ji Allah (ac) re îbadet tê kirin û hemû hezkirin û tirs û hêvî bi bal Allah (ac) ve tê beralîkirin ve dikin.

**Em te gazî mexfîreta Allah (ac) û Cennetên Firdews ku warê selametê ye ve dikin.**